


Hevalino!

Xwe bigirin, em ê
bi hev ra herin
Marsê.





Kovareka perwerdeyî,
zanistî û çandî ya zarokan e.
Yek jî berhemên Ararat groupê ye.

Silav hevalên min!

Ara Zarok; mala we ye, warê hêvî û xewnan e.
Kovara me rêka zanist, perwerde û çanda kurdî ye.
Pencereya cîhana zarokan e.
Him dibistan, him jî xemrevîna we ye!
Nifşen ku bi zimanê kurdî dixwînin; digihêñ û çav li tîpêñ
kurdî digerînin, lê mixabin saziyeka taybet heta niha li
Rojavayê Kurdistanê jî bo wan nehatiye avakirin, lewma Ara Zarok bîryar
da û rahişte vî barî û bi hêvî ye ku karibe dilopekê li kanîya
rojnamegerîya kurdî ya herikbar zêde bike.



Ara Zarok; çêja jîgîna zarokêñ Kurdan e!

Ara Zarok



17.08.2020

Birêveberîya kovarê: Silêman Osman

Sernivîser û Sererastker: Raman Hesê

Nîgar: Nêçîrvan Ehmed

Dîzayin: Hasan Mihemed

Mihemed Osman

© Hemû maf parastî ne.
www.arasat.online/zarok

Rêbera Arayê

Çirok
Şengilo, Mengilo
û Qalîçengilo

10

Şar
Qamişloka
Evinê

14

A
Kurdî
Merşa Tipan


22

Stêrnasî
Behram, Mars

Çavbaz
Nêçîra peyvan
Lîstok

Sirûd
Ferhadê İcme
Rovî





Ferhadê Îçmo
ROVÎ

"Hat rovîyê biharê
Rûnişt li ser zinarê
Xwe berda nav koxê gund
Berî heyva êvarê



Bû qîjqîja dîkê zer
Mirîşka xwe neda ser
Bextê rovî tenî bû
Kete tora dîkê şer

Dîk û rovî pev ketin
Gundî li wa der ketin
Kûçik û tajîyên gund
Li ber rovî veketin




Rovî kirin piç û par
Danîn ser riwê savar
Mele berî gundîyan
Dest pê kir û serî xwar



Dîkê zer serî hilda
Mirîşka zû çav kil da
Piştî tîrsa kevnare
Tev azad bûn ji derda.”

Wexta em li hev kom dîbin, em bi lîstika
çavgirtinikê dilîzin. Em dîbin xelek û yek ji
me vê stranê dîbêje:

“Yek dudo
Behwer sisê
Çeqla tisê
Mamo dîno
Kevirê şîno
Kumhêlîno
Şaşıkşîno
Simbelboqo
Çavzerdoqo
Qesra 'Elî
Çarde derî
Yek jê Meter
Yek jê Teter
Navê Xwedê
Elahû ekber”




Gotina dawî li kê bikeve, ew tê bijartin ku lîstikê bide destpêkirin. Wî çaxî em çavên wê/wî bi destmalekê girê didin û dev jê berdidin, li dora wê/wî dizîvirin, dîkenin, henekan pê ra dîkin û destêن xwe li pişta wê/wî dixin. Ew jî destêن xwe li ba dîke û dixwaze me bigire.

Ku yek jî me were girtin; çavên xwe vedike û destmalê li çavên a/ê hafî girtin girê dide û dibe dora wê/wî.



**Heya em biwestin,
lîstik wilo dewam dike.**

**Tu jî hewl bide vê lîstikê
bi hevalên xwe ra bilîzî.**



Nêçîra peyvan ❤

♥ Van peyvên li jêr di xişteyê da
bibîne û xêzkekê li wan bide.

Xurînî – Şîr – Taştê – Firavîn
Şîv – Paşîv – Şor – Penîr – Fêkî
Sebze – Xwê – Dew - Nok

F	I	R	A	V	Î	N
Ê	S	E	B	Z	E	O
K	R	Î	N	E	P	K
Î	H	Ê	T	Ş	A	T
Ê	W	K	R	O	Ş	W
X	U	R	Î	N	Î	E
Ş	Î	R	Ş	Î	V	D

Peyva windayî:
“Qesreka spî ye, bêderî ye?! ”
Ew çî ye?





Ez dixwazim em bi hev ra bikevin pêşbazîyê.

Ka em heft (7) cudahîyan ji vir der bixin
û kî berî kê bi dawî bîne ew ê bi ser bikeve.



Şengilo, Mengilo û Qalîçengilo

Carekê ji caran, xêr û xweşî bibare li guhdaran.

Carekê bizinek ji nav pêz vediqete û berê xwe dide
 çiyê, li çiyê binê zinarekî ji xwe ra dikole, holikekê çê
 dike, ji xwe ra dike axur, tê da dizê; sê karikan tîne.
 Navê yekê dike Şengilo, navê yekê Mengilo û navê ya
 din jî Qalîçengiloyê.



Karikên wê mezin dîbin, maka wan dest pê dike
 qewêtîyan li wan dike û dibêje:
 “Şengilo, Mengilo, Qalîçengilo; ez qurbana we, niha ez
 ê herim çêrîyê, kengî ez hatim û min got:

Şengilo, Mengilo, Qalîçengilo:
 Ez çûme zozana
 Min xwarî pelê kezwana
 Qırşık kete ber dirana
 Şîr kete guhana
 Dayîka we hate dana.
 Werin û derî vekin, werine dana.”



Çend rojan wisa bi vî halî derbas dîkin. Rojekê gur bi wan dihese. Fêm dike ku bizin sibehê zû radibe û diçe zozanan, berî bizin bigihe, gur diçe cem karikan û dîbêje:

“Şengilo, Mengilo, Qalîçengilo:

Ez çûme zozana
Min xwarî pelê kezwana
Qırşık kete ber dirana
Şîr kete guhana
Dayîka we hate dana
Werin û derî vekin, werine dana”



Şengilo dîbêje: “Mengilo, Qalîçengilo, derî venekin, ev ne dêya me ye, ne wextê danan e, dengê dêya me zirav e, lê yê vê qalind e, derî venekin!”
Mengilo dîbêje: “Na, ev dêya me ye. Derî vekin!”

Çaxê Qalîçengilo derî vedîke, hema di cih da gur Şengilo, Mengilo û Qalîçengiloyê dadiqurfîne û dixe gepek. Bizin weke her car di wexta xwe da tê, ku çi bibîne, ne Şengilo, ne Mengilo û ne jî Qalîçengiloyê nexuya ne, bûne parîk nêن.



Bizin radibe diçe cem şahîn û dibêje: “Te karikên min birine?”

Şahîn dibêje: “Bi vî erdî, bi vî esmanî; min ew nebirine, nedîtine û nebînane!”

Bizin diçe cem leglegê, dibêje: “Te her sê karikên min birine?”

Legleg dibêje: “Bi vî erdî, bi vî esmanî; min ew nebirine, nedîtine û nebînane!”

Bizin diçe cem rovî, dibêje: “Te her sê karikên min birine?”



Rovî dibêje: “Bi vî erdî, bi vî esmanî; min ew nebirine, nedîtine û nebînane!”

Bizin diçe cem hirçê, dibêje: “Te her sê karikên min birine?”

Hirç dibêje: “Bi vî erdî, bi vî esmanî; min ew nebirine, nedîtine û nebînane!”

Bizin li derdor dinere, dibîne ku gur tenatena û bi hêdîka dimeşe, di dilê xwe da dibêje:

“Wî gurî karikên min xwariye!”

Digihe cem û dibêje: “Guro! Te her sê karikên min birine newisa?”

Gur bersivê nade, deng jî jî xwe nayîne.



Bizin dibêje: "Nexwe te Şengilo, Mengilo û Qalîçengiloyên min birine!

Şerê min bi te ra şer e!

Guro; tu diranên xwe tûj dike, ez ê jî qiloçên xwe tûj bikim, em ê şer bikin!"

Bizin qiloçên xwe baş tûj dike, gur jî diranên xwe tûj dike. Paşê her du têne meydanê ku şerê hev bikin. Gur dike nake bi bizina kûvî nikare. Bizina kûvî qiloçên xwe tûj li zikê gur dixe, gur dikuje.



Zikê wî diqelêşe, Şengilo, Mengilo û Qalîçengiloyê ji zikê wî der dixe û dibêje: "Şengilo, Mengilo, Qalîçengilo, ci bi we hafibû, çavê dêya we kor be!"

Dibêjin: "Hal û hewalê me û guri ev e, wiло bi me ra çê bû."



Bizin dibêje: "Şengilo, Mengilo, Qalîçengilo, ez qurbana we bim, bila ev ji we ra bibe zende. Careka din şiret û qewêtiyên min ji bîr nekin û şaş nebin!"


Bizin karikên xwe li pişta xwe dike û berê xwe dide çîye.

Çîroka min ji we ra xweş, bidin min telaşek şebeş.





Qamişloka Evînê



Qamişlo; bajarekê Kurdan e,
li başûr Rojavayê Kurdistanê ye.
Fransî di 20'ê tebaxa sala 1926'ê da
bajêr ava kirine, ji lew ra ew bi navê
"Parîsa Piçûk" tê naskirin.

Niha nêzîkî pêncsed hezar /500.000/ mirov lê dîjîn; heftê ji sedî /70%/
ji wan Kurd in, her wiha Ereb, Suryan, Ermen, Kîldan, Asûr û Cuhû jî lê
dîjîn. Li Qamişlokê balafirgehek heye, şes /6/ km dûrî navenda bajêr e.





Wêne: Xeber24



Wêne: npasyria

Taxên Qamışloyê

- 'Enterîyê
- Cirnik
- Cirnika Piçûk
- 'Elaya
- Meheta kevin
- Mehmeqeya
- Meyselûn
- Sîyahî
- Hilelîyê
- Qisûr
- Sîna'a
- Taxa Bergîlan
- Qidûrbeg
- Bişerîyê
- Kornîş
- Taxa Teyîyê
- Erbewîyê
- Xerbîyê
- Wista
- Taxa Cûdîyê





Dîrok

1950



1961




2004

Di 12'ê adara 2004'ê da; ji ber bûyerên ku li matîsekê qewimîn dema tîma Cîhadê li lîstikgeha Qamîşloyê goga pêyan dilîst, gelê Kurd ji ber hin sedeman raperîn kir û li hember rêjîmê serî hilda. Wisa leşkerên rêjîma Sûrîyeyê bêtirî sih /30/ Kurdî kuştin û bi sedan birîndar kirin û bi hezaran girtin.

Navdarên Qamişloyê

- Mihemed Şêxo "Hunermend"
- Cegerxwîn "Helbestvan"
- Cum'a İbrahîm (Bavê Teyar)
"Lîstikvanê şanouyê"
- Se'îd Yûsiv "Hunermend"
- Aram Tîgran "Hunermend"
- Şêx Maşoqê Xiznewî
"Zanayê Ola Islamê"
- Heysem Kiço
"Lîstikvanê goga pêyan"
- Ganî Mîrzo "Muzîkjen"



Merşa Tîpan



**“Em şagirt in, em dixwînin A, B, C
Nivîsandin, ew ji me ra armanc e
Tîpêñ me tev sih û yek in Ç, D, E
Xweşî ev e, bi zimanê Kurdmanc e
Ê, F, G, H him rehet e, him şirîn
I, İ, J, K xweş dixwînim bi qîrîn
L, M, N, O hê mayîne hinêñ din”**



Gelî Kurdan, werin tev da bixwînin

P, Q, R, S, Ş, T, U, Û tu meyze

V, W, X ne, ez şaş nakîm yek levze

Heşt dengdêr in, herçî dengdar bîst û sê

Rêya ronî dibistan e, ma Y, Z.”



Hisêne Emîn
1943'ê



Ez zanim tu gelek jîr û!

Ka em bi hev ra van mamikan nas bîkin.

1- Tiştekê min heye

“Spî ye, spî ye weke bez.

Ne tu dixwî, ne jî ez!”

Ew çi ye?

2- Mamika min dibêje:

“Jî vir heta Mûsil.

Hemû keçikên çav bîkil!”

Ew çi ye?



Ka vê zûgotinokê sê caran li dû hev bibêje!

- Kurm qurm qul kir.
- Kurm qurm qul kir.
- Kurm qurm qul kir.

Zûgotinok

Gotinên Pêşîyan

Hevalên delal; ka werin em binerin pêşîyên me ci gotine:

"Qenc kiro, bixwe kiro.


Xerab kiro, bixwe kiro!"

- Em ci tiştên bed bikin ew ê were pêşîya me, lewma divê em her tim çê bin da ku ji başîyê bêpar nemînin û bibe rêhevala her gavê.







Hevalino! Xwe bigirin, em ê bi hev ra hêrin Marsê!



Behram, Mars an jî Merîx; yek ji her heşt gerestêrkên pergala Rojê ye.

Behram: piştî gerestêrkên "Tîr, Gelawêj û Erdê", ew a çaran e ku nêzîkî Rojê ye, lê belê ew 227,9 milyon km dûrî Rojê ye.




Phobos




Deimos

Behram bi gelekî jî dinya ku em lê dijîn piçûktir e, lê du gerestêrk jî li dora Behramê digerin, navê yekê "Fobos" û ya din jî "Dîmos" e.




Eger hûn bixwazin li ser
Behram an ku Marsê bijîn, wî
çaxî hûn ê xwe li jor bibînin û
pê bihesin ku hûn difirin, ev ji
ber tinebûna Rakêşê ye. Rakêş
dihêle ku lingên me bi erdê ve
bimînin û ji hevsengîya xwe
nekevin.



Behram "Mars" li cem
Babilî û Yewnanêñ kevin;
sembola xwedayê şer û
cengê bû. Babilî nav lê
dikirin "Nergal" û
Yewnan jî jê ra digotin
"Ares".

Li gor zanînêñ dawî; Behram hişk û bêav e!



Rengê axa erda wê zerê
ber bi sor ve ye û dema
ba lê radibe, axê bi xwe
ra radike û bablîsokên
tozê çê dike.



Keştiyêñ gerdûnî yêñ ku gihane Behramê, gelek
agahîyêñ nû li ser dane,



lê pirsa mezin ew e
ku; gelo mirov
dikare li Behramê
bijî?!




Heya niha hîna bersiv
xweşik xuya nebûye, lê belê
hin dîyardeyêñ jîyînê hene!

Tu çi dibêjî?!

Gelo di salêñ bêñ da em ê
karîbin li ser rûyê Behramê
bijîn an na?!

Rêya rast bibijêrin û alîkarîya ARA bikin da ku bigihe Marsê.




Jî bîlî Erdê:

navê gerestêrkên rojê bi zimanê erebî ji malbata xwe bipirsin û li jêr navêwan ên kurdî binivîsin.

Tîr	Gelawêj	Behram	Berçîs	Keywan	Ûranûs	Neptûn



DO YOU SPEAK ENGLISH?



Apil



Dog



Toyî





John: Hello!
My name is John.

Hello! Mayî nêm iz Con



Ara: Silav John!
Navê min Ara ye.



Şebiro

Kisobo

Mayî



مەھىدا!
مەھى فەلە. خىا مەھى؟

Şilomo! Şêm Rîta. Mono Şimox?

Ara: Silav Rîta!
Navê min Ara ye.



Salihê Heydo

Folklorenas, helbestvan,
lêkolîner, nivîskar û kurdnasê
Kurd Salihê Heydo di 6'ê adara
sala 1956'ê li gundê Hesê Ûso
ku girêdayî devera Amûdê ya
Rojavayê Kurdistanê ye çavê
xwe li dinyayê vedike.

Xwendina xwe ya seretayî li
gund û ya navîn li bajarê
Hesekê kiriye. Sala 1970'ê dest
bi nivîs û xwendina bi zimanê
kurdi bi tîpêñ latînî kiriye.



Heta niha heftê û şes (76) pirtûk çê kirine, ji nav wan cil û du (42) pirtûk çap bûne.

Navê hin pirtûkan:

- 1- Dîwana "Kêferat"
- 2- Dîwana "Birîna Kûr"
- 3- Serpêhatîya "Temûzê Kildanî û Axayê Şêrwani"
- 4- Dîwana "Evîna Welêt"
- 5- Şes berg dûrîkên "Folklorê Kurdên Rojavayê Kurdistanê"

"Miletên zindî; mirîyen xwe sax dikin û miletên mirî; saxên xwe dimirînin!"

Salihê Heydo

Û gelek pirtûkên zarokan ên "Lîstik, Mamik, Têderxistinok û Sirûdan", her wiha Serpêhatî û gotinêni pêşîyan jî gelek kom kirine.



Berdilîyên min ên şengok; ez îro çûm “Orkestraya Rojavayê ya Zarokan”.

Oy ci qas xweş bû!

Dengê muzîkê ji her derê dihat û hemû jî stranbêj û muzîkjen bûn.

Ka werin ez hevalên xwe bi we bidim naskirin.

Hûn jî herin û bibin hevalên wan!



Cîya Evdikê



Mihemed Şêxmûs



Şîrîn Mihemed



Mihemed Hesen



Aryana Hemze



Zana Hadî



Sosona Ehmed



Nûh Mihemed



Hêvî Mihemed





#



Lolan Evdikê



Rodi Çelebi



♩



Hevalên min!

Ka werin ez ji we ra çirokekê vebêjim.

Carekê li dibistanê ez û hevalê xwe Şivan piştî waneyan em der ketin navberê û em li ser gîya rûniştin.

Me behsa helbestên Cegerxwîn dikir û çi qasî xweş dinivîse. Hîn wîlo em diaxivin, hevalê min pişkiya, min jê ra got: "Aram bijî" wî jî got: "Spas", lê mixabin zendê xwe nede ber devê xwe, ev tişt ez gelek tirsandim!

Aniha nexweşîya Corona li cîhanê tev belav bûye, pizîşk her dem qewêtî û şîretan dîkin ku dema em bipişkin, divê em dest an jî zendê xwe bidin pêş dev û bêvilên xwe, pê ra jî maskan li ser rûyêñ xwe bihêlin û destêñ xwe gelekî baş bişon da ku nexweşîyê negihînin kesên din.



Piştî Şivan pişkîya, min ev tişt hemû jê ra gotin ku divê gelekî hay ji
xwe û kesên li dora xwe hebe; ji ber Corona yan jî "COVID-19"
nexweşîyeka gelekî xerab e û jîyana mirovan dibe.





Orkestraya Rojavayê ya Zarokan

Bilûra kurdî



Amûra ku bi hêza bayê deng der dixe û bi bayê diranan tê pifkirin.

Sêzdeh /13/ taximên bilûrê hene.

Ji bo dengê hemû meqaman der bixîne; dirêjbûn û
kinbûna wê girêdayî meqamê ye.

Meqama herî dirêj heştê û yek /81/ û
ya herî kin sih û heşt /38/ e.

Heşt /8/ kunên bilûrê hene; heft /7/ li jor û yek /1/ li jêr e.



Bilûr; ji darêñ gûz, mişmiş, tû û qamîşê têñ çekirin.

Bilûr; amûreka dîrokî ya pir kevin e. Di dema Neolîtîk da hatiye bikaranîn. Hêjayî gotinê ye ku ew vedigere berîya sih û pênc hezar /35,000/ salî.

Bilûr li cem Kurdan bi şivanan ra hatiye naskirin.

Şivanan bi dengê bilûrê pezê xwe aram dikirin û dicivandin.

Li ber dengê bilûrê şahî û govend dihatin gerandin û dengbêj di civatan da bi dengê bilûrê ra distractandin.



Egîdê Cimo; bilûrvanekê Kurd û binav û deng e,

ew bi navê "Mîrê bilûrê" tê naskirin.



Gurên Revok




"Hespo!
Tu bi ku
ve diçî?"



"EZ ê herim zozanan
Bigerim mêrg û çîmanan
Bixwim gul û gîhanan
Payîzê bînim aranan."



"EZ ê jî
bêm."





"Em ê herin zozanan
Bigerin mîrg û çîmanan
Bixwin gul û gîhanan
Payîzê bînin aranan."



"Em ê herin zozanan
Bigerin mîrg û
çîmanan
Bixwin gul û gîhanan
Payîzê bînin aranan."

"Ez ê jî
bêm."



"Hespo, dîko,
berano;
hûn ê bi ku
ve herin?"

"Ez ê jî
bêm."





"Birevin, mala we xirab bû!
Wexta ez çüm bi ser wan da,
yekî bi serê min girt, kire
navbera du dara, yekî hate
min bi gopala, yekî tirba
min dikola, yekî jî hewar
dighande mala!
Bi zorê min xwe ji destên
wan der xist reviyam,
hatim vir."

"Kuro, qey ci heye,
ci bi te hat?"



"Kuro! Lez
bikin birevin,
nesekinin.
Zû birevin!"






QR'a kovarê



QR'ê scan bike




Li bende be!




Kovarê bixwîne.

**QR'ê bi kamerayêñ telefonêñ xwe scan bikin û kovara
me bi forma PDF'ê daxînin.**





Cegerxwîn 1903-1984



Em hejmara xwe ya yekê di salvegera koça sih û heftê "37" ya
seydayê Cegerxwîn da diweşînin û dîyarî gîyanê wî dîkin.



Ara Zarok; çêja jîyîna zarokên Kurdan e!